Karlskoga

## Agahiyên li ser mecbûriyeta çûna dibistanê

Çûna dibistanê ji bo hemû zarokên ku diçin pêşdibistanê, dibistana bingehî an dibistana bingehî ya adapteyî mecbûrî ye. Ev tê wê wateyê ku dibe ew her roja dibistanê biçin dibistanê û beşdarî dersan bibin.

Weke welî, hûn berpirsiyar in ku zarokên we werin dibistanê. Dibistan berpirsiyar e ku zarok beşdarî dersan bibe.

Ger sedemek maqûl hebe dibe ku zarok li malê bimîne. Sedemên derbasdar ev in, wek nimûne, ku zarok nexweş e an ji hêla serkar ve destûr jê re hatiye dayîn.

Serkarê dibistana zarokan biryarê dide ku betlaneyê ji bo zarok bê dayîn. Ger sedemên taybetî hebin, wek gorkirin, serkar dikare destûr bide. Serkar jî dikare destûr red bike.

Heger hûn rêwîtiyek plan dikin, dibe hûn demek berî rêwitiyê serlêdana betlaneyê bikin. Ger serkar daxwaza betlaneyê red bike, dibe ku zarokê we biçe dibistanê.

Heger zarok bêyî sedemên maqûl nehat dibistanê, dibe hûn wekî welî cezayê pere bidin. Ji bo nimûne heger zarok ji ber rêwîtiyek ku ji hêla serkar nehatiye pejirandin , neçe dibistanê.